Diyarbakır'da Narin, Tekirdağ'da Sıla, İstanbul'da İkbal ve Ayşenur gadre uğramışlardır. Böylesi sapıklar her milletin ortak sorunudur. İnsan eşrefi mahluktur, yaratılanların en şerefliisidir. Bebeklere, çocuklara, kadınlara kast edenler esfeli safillidir. SGK'dan 8 bin TL alabilmek için pasif ötanaziye başvurarak cinayet işleyen yaratıklar insanlığın yüz karasıdır. Yenidoğan çetesi değil, ölüm ve soygun çetesi denebilir. Konuşmalarının gün yüzüne çıkmasından sonra şöyle düşündüm bir insan daha ne kadar küçülebilir. Bunlara verilebilecek hangi ceza fırın gibi vicdanları soğutabilir,

27 Mart 2023'te CİMER'e yapılan bir başvuru ile başlayan soruşturmanın

na cinayetleri furyasının seriye bağlanması, toplumsal infialin kışkırtılması başka teribin ikmalini akla getirmektedir. Suçlunun yakasından tutulması en haklı taleptir. Bu cinayetler aylar öncesinde gündeme gelmiş ama bugünkü gibi konuşulup tartışılmamıştır. Sağlık Bakanlığı zamanında davaya müdahil olmuştur. Savsaklama söz konusu değildir. Sağlık Bakanının istifasını istemek nasıl bir mantıktır, nasıl bir siyasi hesabın sonucudur. Siyasete malzeme yapmak art niyetlilik değil midir? Bakanın istifasını isteyenlerin işi gücü nifaktır. Bakanımızın sergilediği dürüst, ilkeli duruşundan ötürü tebrik ediyorum.

Kaos ve krizlerin kökleştiği bir dönemde Anadolu güven barış ve istikrar coğrafyası olmalıdır. Güneyimiz yanarken Kuzeyimiz toz duman içindedir, batımızda karanlık oyunlar planlanıyor. Objektif yorumları kendisinden duymak istediğimiz bir siyaset bilimci, güven bunalımının kök saldırdığını, tek çözümün erken seçim olduğunu zirvalarak bunca sorun ortasında iç işgal cephesine hizmetkarlık yapmaktan utanmamıştır. Türkiye'de güven bunalımı yoktur. Bunayan bulaşık tipler

Türkiye'nin yeni bir çözüm sürecine değil, ortak aklı çalıştırmaya, dış dayatmalara kapalı durmaya ihtiyacı vardır. Türkiye'nin sorunu Kürtler değil, bölücü terör örgütüdür. Etnik temelde bir soruna atıf yapmak tehlikedir. Kürt sorunu vardır demek Kürtleri sorun gören sahte yüzlerin sözlere dir. Terör başka siyaset başkadır. Silah dışlanmadan Türk vatandaşları layık olduğu insanlık seviyesine ulaşamayacaktır. Hiçbir taviz geri adım teröristi tatmin etmeyecektir. Terörün silahsız çözümü yoktur. Terör örgütünün taleplerini kabul etmek ona boyun eğmek değildir. Bölücü terör örgütü PKK'nın silahlı eylemleri başarısızlığa mahkumdur. Türkiye teröre müsamaha göstermeyecektir. Demokratik reformların yapılması akla en yakın gerçektir. 6 Haziran 2011'de Diyarbakır mitinginde demişim ki, Brüksel'dekiler sizi benden daha iyi tanıyamaz. Bütün teröristlerin silahlarıyla dağdan inip teslim olması, cezalarını çekmeleri tek çözümdür. Ne ABD, AB, Irak, Suriye ile birlikte içimizdeki bazı unsurların terör örgütünün sözcüsü olması kabul edilebilir değildir. Terörsüz bir siyaset hususunda herkes ittifak halindeyse değil, elimizi gövdemizi taşın altına koymaya hazırız. Teröristbaşı buyursun terörün bittiğini tek taraflı ilan etmiş demişim. Bu çağrımın iç yüzünü anlamayan ve saptırmaya çalışanlar fazladır. Türkiye Yüzyılında terörü sıfırlamak amacına matuf ikinci hüküm cümlem şöyledir: Şayet terörist başının tecridi kaldırılırsa gelsin, TBMM'de DEM Grup Toplantısı'nda konuşsun. Terörün tamamen bittiğini ve örgütün lağvedildiğini haykırın. Bu dirayeti gösterirse umut hakkının kullanımıyla ilgili yasal düzenlemenin yapılmasının önu de ardına kadar açılınsın. Adres İmralı'dan DEM'e uzansın."



manidar. Provokasyon her tarafından belli olmaktadır" diyerek saldırıyı kınadı

DEM Parti Grup Başkanvekili Sezai Temelli TUSAŞ saldırısına ilişkin olarak "Zamanlaması manidar. Provokasyon her tarafından belli olmaktadır" diyerek saldırıyı kınadı. Grup Başkanvekili Sezai Temelli, TUSAŞ saldırısını kınadı. Temelli, TBMM Genel Kurulunda şunları söyledi:

"Çok üzgünüz. Yine insanlarımız öldü. Ölenlere Allah'tan rahmet diliyorum yaralılara acil şifalar diliyorum. Bu olaya bu olay kapsamında bakmamak gerekiyor. Bu ülkede bir kaç haftadır çok önemli bir tartışma sürdürülüyor. Bunun çok çok önemli bir kısmı Türkiye toplumun beklentilerine yanıt veriyor. Türkiye toplumu bu savaş şiddet ölümlerden kurtulmak isterken böyle bir olayla karşılaşılıyor."

Zamanlaması manidar. Provokasyon her tarafından belli olmaktadır. Dolayısıyla bu tür şeylere karşı ısrarla inatla toplumun beklentisi olan barış içinde olan beklentisine yanıt vermek zorundayız. Geç kaldığımız her adım yitip giden canlara mal olmaktadır. Ben bu olayı bir daha kınıyorum."

Ne olmuştu?

Türkiye İçişleri Bakanı Ali Yerlikaya, bugün Türk Havacılık ve Uzay Sanayii A.Ş'nin (TUSAŞ) Havacılık Bulvarı Kahramankazan Ankara yerleşkesindeki giriş kapısında saldırı düzenlendiğini duyurdu.

Yerlikaya, "Türk Havacılık ve Uzay Sanayii AŞ. (TUSAŞ) Ankara Kahramankazan tesislerine yönelik terör saldırısı gerçekleştirilmiştir. Saldırı sonrası maalesef şehit ve yaralılarımız bulunmaktadır. Şehitlerimiz Allah'tan rahmet; yaralılarımıza acil şifalar diliyorum. Gelişmelerden kamuoyu bilgilendirilecektir. Resmî kaynaklardan yapılacak açıklamaları dikkate alınız" dedi.

CHP lideri Özel : El yükseltiyorum, ben de Kürtlere devlet teklif ediyorum

CHP lideri Özel partisinin grup toplantısında MHP lideri mayacaksa her kim ne söylüyor-sa değerlidir. Tam destek vere-



Bahçeli'nin Öcalan hakkındaki ifadelerini değerlendirdi. Özel "Ben de Kürtlere bir devlet teklif ediyorum. Kürtlere, Türkiye Cumhuriyeti'nin sahibi olmayı teklif ediyorum" diye konuştu.

CHP Genel Başkanı Özgür Özel partisinin grup toplantısında konuştu.

MHP Genel Başkanı Devlet Bahçeli'nin partisinin grup toplantısında PKK lideri Abdullah Öcalan'a yaptığı çağırışı eleştiren Özel "Geçmişteki laflarının tekrarıdır, yine Meclis'i dışlamaktadır. Ne yapılacaksa TBMM'de yapılacak" diye konuştu.

Konuşmasında "Şehit gelmeyecekse, kan akmayacaksa, askere namlular doğrultul-

mayacaksa her kim ne söylüyor-sa değerlidir. Tam destek vere-

ceğiz" ifadelerini kullanan Özel "Türkiyle Kürtüyle herkesin gözü önünde bir süreci savunuyoruz" dedi. Özel'in açıklamalarından öne çıkanlar şöyle:

Bahçeli'nin grup toplantısında ki "Öcalan gelsin Meclis'te konuşsun" açıklamalarına da yanıt veren Özel "Türkiye'de bir daha şehit gelmeyecekse kan akmayacaksa anaların gözyaşı duracaksa, askere namlular doğrultulmayacaksa her kim ne söylüyor-sa değerlidir. Tam destek vereceğiz" dedi.

Özel şöyle devam etti: "Devlet bey zaten çok sık döner, o döndü diye biz de doğru bildiğimizi söylemekten geri durmayacağız. Geçmişteki laflarının

tekrarıdır, yine Meclis'i dışlamaktadır. Ne yapılacaksa TBMM'de yapılacak, şeffaflıkla yapılacak, tutulmayacak bir söz verilmeyecek ve samimiyetle yürütülecek. Tam bir mutabakat olmadan sonuç olmaz, olmayacak. Daha sonrası daha kötü başlayacak ve daha kötü üzüleceğiz."

Özel konuşmasının devamında şunları kaydetti:

"Biz asla barışa kardeşliğe karşı çelişkili bir söz söylemeyeceğiz. Silahların bırakılmasını savunurken, 86 milyonun kucaklaşmasını savunurken, sesimiz titremez bizim. Çık şeffaf Türkiyle Kürtüyle herkesin gözü önünde bir süreci savunuyoruz. Milleti birbirine düşman edecek her hareketin karşısında durduk.

El Yükseltiyorum. Ben de Kürtlere bir devlet teklif ediyorum. Tam olarak kendilerini devlete ait hissetmeyen Kürtlere, Türkiye Cumhuriyeti'nin sahibi olmayı teklif ediyorum. Kendini öteki hissetmediği tüm demokratik siyaset kanallarının açık tutulduğu, üniversitelerde öğrencilerin haklarının yenmediği, demokratik hakların dünya standartlarında olduğu bir ülke yapalım, Kürtleri Türkiye Cumhuriyetinin sahibi yapalım. Biz kurucu parti olarak buradayız, her şeyi hep birlikte yapmayı teklif ediyoruz. Hodri meydan.

Erdoğan'dan Bahçeli'nin 'Öcalan' çıkışı sonrası ilk açıklama

Devlet Bahçeli'nin Öcalan açıklaması sonrası konuşan Türkiye Cumhurbaşkanı Erdoğan "Haritalar yeniden kanla



çizilmek istenirken, iç cephemizi kuvvetlendirmeye çalışıyoruz. Siyasette yeni ve temiz bir sayfa açılmalı, milletimizin beklentisi de bu yönde" dedi.

Türkiye Cumhurbaşkanı ve AK Parti Genel Başkanı Recep Tayyip Erdoğan, partisinin genel merkezinde gerçekleştirilen İl Başkanları Toplantısı'nda konuştu. Erdoğan'ın açıklamalarından öne çıkanlar şöyle: Sınırlar yeniden çizilmek istenirken, iç cephemizi kuvvetlendirmeye çalışıyoruz

Haritalar yeniden kanla çizilmek istenirken, İsrail'in Gazze'den Lübnan'a taşıdığı savaşı sınırlarımızı yaklaşırken, iç cephemizi kuvvetlendirmeye çalışıyoruz. Türkiye ortak paydasında 85 milyon olarak bir araya gelelim istiyoruz. 85 milyona gelin, bir olalım, iri olalım, diri olalım diyoruz. Siyasette yeni ve temiz bir sayfa açılmalı, milletimizin beklentisi de bu yöndedir.

Cumhur ittifakı olarak açtığımız fırsat penceresi hırsla kurban edilmemeli

Türkiye'nin geleceğinde terör ve terörün karanlık yüzüne yer yoktur. Hep beraber terörün ve şiddetin olmadığı bir Türkiye'yi inşa edelim istiyoruz. Cumhur İttifakı tarafından açılan tarihi fırsat penceresinin kişisel hesaplara, hırsla kurban edilmemesini ümit ediyoruz.

Terörün olmadığı bir Türkiye inşa edelim

Siyaset kurumu, Meclis, sivil toplum, basın, akademi ve toplum olarak terörün olmadığı bir Türkiye inşa edelim. Devlet millet için ve millete hizmet için vardır. Devletin görevi vatandaşına imkanlar dahilinde en iyi hizmeti sunmaktır. Bu temel konularda zafiyeti olan bir devlet, vazifesini hakkıyla yerine getiremiyor demektir.

AK Parti'den Neçirvan Barzani'nin Ankara ziyareti ve yeni 'çözüm sürecine' ilişkin açıklama



AK Parti Genel Başkan Yardımcısı ve Parti Sözcüsü Ömer Çelik, parti genel merkezinde, Türkiye Cumhurbaşkanı Recep Tayyip Erdoğan başkanlığında gerçekleştirilen MKYK toplantısına ilişkin açıklamalarda bulundu.

AK Parti Genel Başkan Yardımcısı ve Parti Sözcüsü Ömer Çelik, parti genel merkezinde, Merkez Karar ve Yönetim Kurulu (MKYK) toplantısına ilişkin açıklamalarda bulundu.

Çelik, açıklamalarının ardından basın mensuplarının sorularını yanıtladı.

Neçirvan Barzani'nin Ankara ziyareti

Kürdistan Bölgesi Başkanı Neçirvan Barzani'nin Türkiye'yi ziyaretine ilişkin değerlendirmesi sorulan Çelik, "Burada problem



YNK'nin (Kürdistan Yurtseverler Birliği) yanlış yönde hareket etmesidir. Biz, KYB yetkililerine de şunu söylüyoruz: Türkiye'ye karşı faaliyet yürüten terörist unsurlarla herhangi bir şekilde yan yana durmasınlar, bunlarla ilişki içerisinde gözükmesinler. Bu hassasiyetleri koruma bakımından Neçirvan Bey'in ziyareti önemlidir" ifadelerini kullandı.

Yeni çözüm süreci mi başlayacak?

"Türkiye'de yeni bir çözüm süreci mi başlayacak? Bu uzlaşma söylemleri ne anlam ifade ediyor?" sorusuna Çelik, "Türkiye'de iç cephenin güçlü tutulması Türkiye'de yaşayan herkes için bir sorumluluk olmalı. Özellikle de siyaset kurumu bu sorumluluğu yerine getirmelidir ama tabii burada

Türkiye Cumhuriyeti'nin niteliklerinden, meşruiyet alanından taviz verme gibi bir şey söz konusu değil. Özellikle terör örgütüne destek veren ifadeler kullanan siyasi partiye dönük olarak, terörle mesafe koymaları ve bir Türkiye partisi olmalarına dönük bir davettir" yanıtını verdi.

Özgür Özel'in Demirtaş'ı ziyareti Çelik, CHP Genel Başkanı Özel'in, eski HDP Eş Genel Başkanı Selahattin Demirtaş'ı ziyaret etmesine yönelik soruya ise ziyarette yapılan açıklamalarda her iki tarafın da hükümeti hukukun üstünlüğüne saygı duymaya çağırıldığını söyledi.

Çelik, şöyle konuştu:

"Hukukun üstünlüğüne saygı duymaktan bahsedenlerin öncelikle terör örgütü hakkında ne düşündüğünü söylemesi lazım. Kobani olaylarında gerçekleşen eylemleri ve yapılan konuşmaları biliyoruz. Terörist başının heykelini dikmekten kimin bahsettiğini biliyoruz. Onlarla hesaplaşmadan, onlarla yüzleşmeden hukukun üstünlüğünden bahsetmek sadece bir takibe oluyor. Hukukun üstünlüğü, öncelikle terörün dışlanmasından geçer çünkü hukuk devletinin en büyük tehdidi terördür ve terör örgütleridir."

Kürdistan Parlamentosu'nda ilk oturum ne zaman yapılacak?

Kürdistan Bölgesi'nde 20 Ekim'de yapılan milletvekili seçimlerinin kesin sonuçları açıklandıktan sonra Parlamen-



to ilk oturumunu 10 gün içinde gerçekleştirecek. Irak Bağımsız Yüksek Seçim Komisyonu, seçimlerden bir gün sonra ön sonuçları açıkladı. Komisyonun kesin sonuçları önümüzdeki birkaç gün içinde açıklaması bekleniyor.


Kürdistan Parlamentosu Hukuk İşleri Danışmanı Wiryâ Sadi, içtüzüğe göre komisyonun kesin sonuçları açıklamasının ardından parlamentonun 10 gün içinde toplanması gerektiğini söyledi. Sadi, Parlamento İçtüzüğü'nün 11'inci maddesinin 2'nci paragrafında ilk oturumun "en yaşlı üye" sıfatını taşıyan milletvekilinin başkanlığında gerçekleşeceğini, bu oturumda parlamento başkanı, yardımcısı ve sekreterinin belirleneceğini aktardı. Komisyonun açıkladığı sonuçlara göre; Yeni Nesil Hareketi'nden parlamentoya girmeyi başaran Muhammed Süleyman en yaşlı vekil sıfatı taşıyor. Sadi, "Parlamento İçtüzüğüne göre parlamentonun başkanlığının ilk oturumda seçilmesi gerekiyor ancak seçim siyasi bir anlaşma gerektiriyorsa taraflar anlaşmaya kadar oturumun açık tutulması gelenekseldir" dedi. Kürdistan Parlamentosu İçtüzüğü, başkanlık divanının üç üyesinden en az birinin kadın olması şartını koyuyor.

12'inci maddede, ilk oturumda parlamento başkanı ve seçilen yardımcılarının göreve başlamak için yemin edeceği belirtiliyor. Sonra aynı yemini milletvekilleri de okuyacak.

"Kürdistan halkının çıkarlarını, toprak bütünlüğünü, milletini, onurunu, vatandaşların hak ve özgürlüklerini ve kamu malını koruyacağıma Allah'a yemin ederim ve bir üye olarak görevimi doğruluk ve sadakatle yerine getireceğime yemin ederim." İçtüzüğü'nün 13'üncü maddesinin 1'inci paragrafına göre yemin eden üyeler resmen milletvekili olarak göreve başlayacak. Aynı maddede, "Gerekçesiz olarak 30 gün içinde yemin etmeyenlerin daha sonra yemin etme hakları olmayacak" deniliyor.

Serokwezîrê Îraqê: Gelê Herêma Kurdistanê pîroz dikim

Serokwezîrê Îraqê Mihemed Şiya Sûdanî temambûna pêvajoya dengdana hilbijartinên Parla-



mentoya Kurdistanê pîroz kir. Sûdanî her wiha pesnê Komîsyaya Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê jî da.

Mihemed Şiya Sûdanî li ser bi dawîbûna pêvajoya hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê daxuyaniyek belav kir.

"Gelê Herêma Kurdistanê pîroz dikim"

Mihemed Şiya Sûdanî hêviya serkeftinê jî aliyên re xwest û wiha got:

"Ji bo birêvebirina pêvajoya hilbijartinên dewreya 6an a Parlamentoya Kurdistanê, pîrozbahiyê li gelê me yê Herêma Kurdistanê ya Îraqê, Serokatiya Herêma Kurdistanê, Hikûmeta Herêma Kurdistanê û hêzên siyasî û namzedên serbixwe dikim.

Berdewamkirina bijardeya demokrasîyê, rêzgirtina li nîrxên demokrasîyê û baweriya bi veguhastina aştiyane ya desthilatê dabînkirina destûrê dupat dike.

"Bi vî minasebetê ji bo serkeftibûna wê di pêvajoya hilbijartinan de, em spasiya hewlên Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan dikin."

Sûdanî hêvî xwest ku pêdiviyên avakirina hikûmeta nû ya Herêma Kurdistanê werin temamkirin da ku pêvajoya bipêşketin, hevkarî, aramî û xizmetkirina gelê Herêma Kurdistanê jî berdewam bike.

ÇEWLÎG - Xwendekaran li dijî tundûtûjiya li ser jinan xwepêşandan kir

Li parêzgeha Çewlîgê ya Bakurê Kurdistanê xwendekarên zanîngehê meşiyân û li dijî tundûtûjiya li ser jinan nerazîbûna xwe nîşan da.



Endamên Klûpa Xwendekaran a Erasmûsê li pêşiya Navenda Kongreyê ya Recep Tayyîp Erdogan a Zanîngeha Çewlîgê civiyan.

Xwendekaran bi yekdengî dirûşm gotin ku ew li hemberî tundûtûjiya li ser jinan bêdeng namînin.

Xwendekaran bi armanca protestokirina tundûtûjiya li ser jinan çalakiya rûniştina bêdeng kir û piştî wê daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de amaje bi wê yekê hat kirin tundûtûjiya li ser jinan ne pîrozîkeke şexsî ye û nîşaneyê civaka rûxîyayî ye.

Her wiha amaje bi wê yekê hat kirin ku jin tenê ji ber ku zayenda wan jin e divê rûbirûyê kuştinê û windakirinê nebin.

Li Tirkîye û Bakurê Kurdistanê roj bi roj tundûtûjiya li ser jinan zêde dibe û jin tîn kuştin.

Nêçîrvan Barzanî: "Xelkê Kurdistanê qezenc kir"

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî li ser encamên hilbijartinên Parlamentoya Herêma Kurdistanê daxuyaniyek belav kir û xwest hikûmet zû were avakirin.

Nêçîrvan Barzanî diyar kir ku di hilbijartinan de yê serkeftiyê bûye xelkê Kurdistanê ye.

Nêçîrvan Barzanî bangî aliyên kir ku piştî pesendkirina encaman divê aliyên siyasî di demeke zû de dest bi avakirina hikûmetê bikin.

"Xelkê Kurdistanê qezenc kir"

Nêçîrvan Barzanî di peyama xwe de hemû alî pîroz kirin û wiha got:

"Bi boneya serkeftina hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê bi germî pîrozbahiyê li tevahiya xelkê Kurdistanê û hemû pêkhatiyên wê dikim.

Hilbijartin û pêvajoya dengdanê ji bo xurtkirina pêvajoya demokratîk a gelê Kurdistanê gaveke girîng bû.

Hevkariya hemû aliyên ji bo serxistin û birêveçûna pêvajoyê bêpirsgirêk cihê şanaziyê ye. Di vî serketinê de gelê Kurdistanê qezenc kir."

Berdewamiya peyama Nêçîrvan Barzanî wiha ye:

"Hilbijartin ji bo nûkirina rewatiya dezgehên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û gihandina nêrîn û dengên xwe bi azadî ji bo hilbijartinan nûnerên xwe di parla-



mentoyê de bû.

Tiştên ku bi rihê pêşbazîya aştiyane û beşdariya berfireh a welatiyan di kampanya û pêvajoya dengdanê de hat dîtin îsbat dike ku xelkê Kurdistanê li ser pêdagirî bi prensîbên demokrasîyê û mafê xwe yê biryardayîne ji bo diyarkirina çarenivîs û paşeroja xwe bi îsrar e û nîşana zîndîbûn û zêdetir pêgihîştina çanda demokratîk a gelê Kurdistanê ye.

Gelek spasiya xelkê Kurdistanê, hewl û xebatên Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan, UNAMI û Hikûmeta Herêma Kurdistanê û aliyên pêwendîdar ên Îraqê û hemû aliyên pêwendîdar yên ku di serkeftina vî pêvajoyê de beşdar bûnê dikim.

Pêdagirî û hevkarîya we hemû aliyên kilîta vî serkeftinê bû. Em

spasiya hemû aliyên dikin.

"Hilbijartinên aştiyane û şaristanî serkeftineke mezin e"

Hilbijartinên aştiyane û şaristanî serkeftineke mezin e ku cîhan bi rêz û hurmet lê dinêre lê ya ku vî serkeftinê temam bike û gelê Kurdistanê bi dilgermî li benda wê ye, ew e ku piştî pesendkirina encaman, divê aliyên siyasî di demeke zû de hikûmetê pêk bînin.

Hikûmetek ku bikaribe aramî û aboriyek bihêztir û mafên zêdetir pêk bîne, şertê pêşîn e vî qonaxê û pîrsgirêkên niha avakirina paşeroja me ya hevbeş e.

Ev jî bi ruhê bihevribûn û biratî û hevkarîya hemû aliyên siyasî û pêkhatayan dibe. Silav li ser giyanê pak ê şehîdan be.

Ji hemû aliyên re serkeftinê dixwazim."

Parlamentera berê: YNKê, bi hemû şiyana milîs û dadgeha federal û yasa jî xistin xizmeta xwe lê karî nivê PDKê deng bîne

Helbijartinên dema şeşem a Parlamentoya Kurdistanê bi dawî bûn, li gor encamên destpêkê ku Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Helbijartinên Îraqê belav kiriye, PDKê 809.197 deng bidest anîn, YNKê jî karî nivê dengên PDKê bidest bixe û bû xwediyê 408.141 dengan.

Vê derbarê de Parlamentera berê ya Îraqê ya ser bi fraksiyona PDKê Şîrîn Abdulrehman Dîna ji BasNewsê re ragehand: "Herçend YNKê wisa nîşan dide ku dilê wê bi wan encaman xweşe û cureyek ji cureyan wek serkeftin pênase dike, lê rastiya wê tiştêkî dine û YNK binketiyê yekem e helbijartinên Parlamentoya Kurdistanê."

Herwaha got: "Hemû kesêkî hişyar wê dizane ku bi mehan berî ku xelk biçin ser sandoqên dengdanê, ji aliê welatekî herêmê ve soz ji wan re hatibû dayîn ku 30 kursî bi sextekarî jî be dê ji wan re bê dabîn kirin, bi keyfxweşî PDKê ev yek aşkera kir û hemû hewlên xwe dan ku bi rêya sextekariyê mezin ve bigihin encam. Dadgeha Federal a Îraqê û gelek şiyânê din ên milîsêna Îraqê xistin xizmeta YNKê, tenê ji bo ku dengên YNKê zêde bikin. Dengdêrên wan partiyên ku li Eniya Terora Fikrî de û eniya neyarên Herêma Kurdistanê de ne, ji bo ku parla-

mentoya Kurdistan li gor wan û di berjewendîya wan de pêkhatiya

yasaya helbijartinan a Parlamentoya Kurdistanê ba, pêwîst bûn



wê çêbe hewl dan, ku bi wê rêyê ve dixwazin Herêma Kurdistanê lewaz bikin an jî hilweşînin."

Şîrîn Abdulrehman Dîna got: "Cîhê keyfxweşiyê ye ku di helbijartinan de xelkê Kurdistanê biryara rast da û neketin bin bandora planên wan aliyên ku dixwazin kirêgirtiyên xwe bikin pîranî li Parlamentoya Kurdistan. Ji bo wê jî nêzîkî 809.197 dengdêrên Herêma Kurdistanê deng dan PDKê, lê YNKê tenê karî 408.141 deng bidest bixe û di encamê de PDK bû xwedî 39 kursî û YNKê tenê karî 23 kursiyan bidest bixe û vî derbarê de jî dîsa dîzayna wela-tan bi rêya Dadgeha Federal ve bi hewara YNKê geheşt, ji ber li gor

helbijartin bi yek bazineyî bihata kirin, lê ewên ku dixwestin her çawa be YNKê serbixin, ew yasa bînpê kirin û bi rêya Dadgeha Federal ve kirin 4 bazine. Eger na helbijartinên Kurdistanê bi yek bazineyê pêkhatiban, naha PDKê dê 46 kursî bidest xistiban." Parlamentera berê got: "Binketiyê yekem di helbijartinê de YNK ye. Ji ber ên ku ewqas bînpêkirin pêkanîn ku dîzaynek li gor qazancê YNKê be, li bendê bûn dengên YNK û çend partiyekî din ên dûvikê wan pir bê bilind kirin û ji bo PDKê ti kursiyan nehêlin. Lê waye em dibinin xelkê Kurdistanê şikest bi wê planê anî û YNK û milîs bêhêvî kirin."

Serok Barzanî: Bila encamên hilbijartinan bibe destpêka qonaxeke nû



Serok Mesûd Barzanî got: Hêvîdarim ev hilbijartin û encamên wê bibe sedema hêviyek nû û destpêka qonaxeke nû ji bo berjewendiya hemû gelê Kurdistanê. Hilbijartinên dewra 6. a Parlamentoya Herêma Kurdistanê bi dawî bû.

Serok Mesûd Barzanî ku piştî hilbijartinan peyamek nivîskî weşand, amaje bi encamdana serkeftina proseya hilbijartinan kir û got, "Gelê Kurdistanê di rewşeke azad de dengê xwe da."

Barzanî got, "Serkeftina vê pêvajoyê bêguman serkeftina gelê Kurdistanê ye û li gel hemû civak û aliyên siyasî. Bi vê minasebetê spasiya gelê Kurdistanê, alîgir û endamên Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) û hemû aliyên siyasî kir.

Serok Barzanî got, "Ez spasiya Komîsyona Hilbijartinan a Iraq û Kurdistanê, hemû aliyên pêwendîdar û hêzên ewlehiyê dikim ku bi hev re bûn alîkar ku proseya hilbijartinên Herêma Kurdistanê bi ser bikeve. Herwiha got: Hêvîdar im hilbijartin û encamên wan bibe sedema hêviyek nû û qonaxek nû bo berjewendiya hemû gelê Kurdistanê."

Komîsyonê encamên fermî eşkere kirin: Kîjan partiyê çend deng standine?



Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê amarên fermî yên hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê eşkere kirin.

Rêjeya beşdariya hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê ji sedî 72 bû.

Li gorî komîsyonê encamên dengên aliyên li parêzgehên Herêma Kurdistanê wiha ne:

HEWLÊR
PDK 345,822
YNK 110,353
Newey Niwê 103,684
Helwest 16,736

Eniya Gel 9,735
Yekgirtû 24,065
Kemel 20,191
SILÊMANÎ
YNK 256,813
Newey Niwê 136,31
PDK 57,832
Yekgirtûya Îslamî 42,622
Komeleya Dadgêrî 36,627
Helwest 29,346
Eniya Gel 20,300
Goran: 9,721
Hawpeymaniya Herêma Kurdistanê:
8,372

DIHOK
PDK 400,603
Newey Niwê 46,444
Yekgirtûya Îslamî 42,447
YNK 28,445
Komeleya Dadgêrî 3,677
Helwest 8,410
Eniya Gel 2,605
Goran 248
HELEBCE
YNK 12,530
PDK 4,940
Newey Niwê: 4,732
Kemel 4,215
Helwest 1,283
Eniya Gel 725
Yekgirtû 7,847
Goran 1,596
Li gorî encamên komîsyonê hejmara kursiyên partiyên li Parlamentoya Kurdistanê wisa ye
Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK): 39
Yekîtiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK): 23
Newey Niwe (Nifşê Nû): 15
Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê (Yekgirtû): 7
Tevgera Helwest: 4
Komeleya Dadgêriyê (Kemel): 3
Eniya Gel: 2
Tevgera Goran: 1
Hevpeymaniya Herêma Kurdistanê: 1

Kanada daxwaza pêkanîna Hikûmeta nû ya Herêma Kurdistanê dike



Ofîsa Balyozxaneya Kanada li Herêma Kurdistanê, pîrozbahiya serkeftina proseya hilbijartinan Parlamentoya Kurdistanê li Herêma Kurdistanê dike û radigehîne: "Em hêvîdar in ku Hikûmeta nû bê avakirin. Roja sêşemê 22.10.2024, Ofîsa Balyozxaneya Kanadayê li Herêma Kurdistanê di peyamekî de li ser hejmara xwe ya taybet Xê de, proseya hilbijartinan Parlamentoya Kurdistanê ku 18 û 20ê vê mehê birêveçû, bi serkeftî nav dibe û amaje bi wê jî dike, nûnertiya wan di roja hilbijartinê de derfet bo wan hatiye dabîn kirin ku çavdêriya proseyê bike.

Di dirêjahiya peyama Ofîsa Kanadayê de hatiye: "Em pîrozbahiyê li xelkê Kurdistan û Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Iraqê dikin bo encamdana hilbijartineke serkeftî, stafa nûnertiya Kanada li Iraqê derfetek jê re hat dabîn kirin ku çavdêriyê proseya hilbijartinan Parlamentoyê bikin û niha jî bi hêviya pêkanîna Hikûmeteke Nû ne."

Serokkomarê Îraqê pîrozbahiyê li Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê dike

Serokkomarê Îraqê bi helkefta serkeftina hilbijartinên Perlemana Kurdistanê



pîrozbahiyê li Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê dike.

Serokkomarê Îraqê Letîf Cemal Reşîd îro (Sêşem, 22.10.2024) bi rêya telefonê peywendî bi Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî kir.

Serokkomarê Îraqê di wê peywendiya telefonî de serkeftina hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê li Serokê Hikûmeta Herêma Kurdistanê pîroz kir.

Partiyên Bakurê Kurdistanê: Encamên hilbijartinê li xelkê me pîroz bin

Partiyên Bakurê Kurdistanê li ser hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê daxuyanî belav kirin û encamên hilbijartinan li xelkê Herêma Kurdistanê pîroz kir.



Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) Bayram Bozyel, Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê ya Tirkîyeyê (PDK- T) Mehmet Emîn Kardaş û Serokê Partiya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) Mustafa Ozçelîk li ser encamên hilbijartinên Parlamentoya Kurdistanê daxuyanî belav kirin.

"Hilbijartin bê pirsgrêk bi dawî bû"

Bozyel di daxuyaniya xwe de wiha got:

Hilbijartinên Parlamentoya Herêma Kurdistanê Federe ku di 20ê Çiriya Pêşîn a 2024an de hatin kirin, di nav pêgeheke demokratîk û aştiyane de derbas bûn. Gelê me bi giranî ji bo hilbijartinan nûnerên xwe çû ser sindoqan û dengê xwe da. Rêjeya dengdane li gorî berê zêde bûye. Hejmartina dengên bêtir pirsgrêkên cidî bi dawî bû. Em pîrozbahiyê li her kesê ku keda wan di lidarxistina demokratîk û serkeftî ya hilbijartinên parlamentoya Kurdistanê Federe de heye dikin.

Em encamên hilbijartinên 20ê Çiriya Pêşîn li hemû partî, kom û parlementerên bi îradeya azad a gel hatine hilbijartin pîroz dikin û ji wan re serkeftinê dixwazin."

"Em Serok Barzanî pîroz dikin"

Serokê PDK- Tyê Kardaş jî li ser encamên hilbijartinan daxuyaniyek belav kir û wiha got: "Em wekî PDK-T (Partiya Demokrata Kurdistanê Tirkîyeyê) serkeftina PDKyê pîroz dikin, gelekî şanaz û kêfxweş bûn. Serokê PDK birêz Mesûd Barzanî pîroz dikin û di herdem û di her mercanda serkeftina cenabê we dixwazin."

"Em hemû aliyên pîroz dikin"

Her wiha Serokê PWKyê jî li ser Mustafa Ozçelîk jî wiha got: Hilbijartinên Parlamentoya Herêma Kurdistanê di 20ê Çiriya Pêşîn a 2024ê bi beşdariya ji sedî 72yê gelê Herêma Kurdistanê pêk hat.

Cihê kêfxweşiyê ye ku hilbijartin, li gel hinek kêmasiyan jî di atmosfereke aram, demokratîk, şefaf û bêyî tûnd û tûjiyê pêk hatîye. Ev nişana wê yekê ye ku li gorî hilbijartinên van salên dawî, gelê Herêma Kurdistanê zêdetir çûne ser sindoqan.

Ev jî ji bo li îradeya xwe xwedîderketina gel, ji bo azadî û demokrasiyê wêneyekî hêvîdar e.

Em gelê Herêma Kurdistanê ji bo lîxwedîderketina îradeya xwe, lîxwedîderketina demokrasî û azadiyê pîroz dikin. Em Hikûmeta Herêma Kurdistanê û hemû partiyên siyasî jî pîroz dikin ku hilbijartineke şefaf, demokratîk û ji tund û tûjiyê dûr pêk anîne."

Mesrûr Barzanî: Em bi ser ketin û wan nekarî

Bi helkefta serketina PDKê di piroseya hilbijartinên gera şeşê Kurdistanê de peyamek arasteyî wan aliyan kir ên ku drûşmên



ya Perlemana Kurdistanê de û mana wê wekî partiya yekê ya Kurdistanê, Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ragehand, "Em bi ser ketin û wan nekarî."

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesrûr Barzanî îro (Duşem, 21.10.2024) bi helkefta serketina PDKê di piroseya hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana

wan "bidawîanîn û têkdan" bûn û got, "Em bi ser ketin û wan nekarî."

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê herwesa got, "Spas ji bo Xudê û piştewaniya xelkî û baweriya wan, em bi ser ketin."

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesrûr Barzanî li roja 02.10.2024ê di çarçoveya civîna

xwe ya bi xwendekar, law û jinan re li Hewlêrê amaje dabû, "Hin alî hebûn pêştir û niha jî bizavê dikin ku qewareya Herêma Kurdistanê nehêlin lê nikarin." Herwesa gotibû, "Bersiva me ji wan re yek peyv e; nikarin."

Wan nekariye ji ber ku vî welatî xwedî hene

Mesrûr Barzanî ron jî kiribû, "Wan pêştir jî bizav kir vê qewareyê nehêlin. Ev niha nîne, ew pêştir jî tevî pîlanên lawazkirina vê qewareyê bûne. Ew amade bûn xwe jî tê bibin, ji bo ku ev hikûmet û desthilatdarî rastî şkestinê bê, ku li jêr serkirdetiya PDKê bû. Bizavên wan ên niha nînin, bizavên wan berdeyam bûne lê wan nekariye ji ber ku vî welatî xwedî hene, vî welatî parêzer hene, xwediyên vî welatî hûn in, parêzerên vî welatî jî Pêşmerge ne."

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê amaje jî da, "Çi kes û alî nikarin karwanê PDKê rawestînin, nikarin vê qewareyê têk bibe."

Neteweyên Yekgirtî pîrozbahiyê li Herêma Kurdistanê dike

Ji bo birêveçûna hilbijartinên Perlemana Kurdistanê, Sikirtêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî pîrozbahiyê li Herêma Kurdistanê û



gelê wê dike. Amajeyê jî dide, "Piroseya hilbijartinan bi awayekî aram û hêmin bi rê ve çû."

Ji bo birêveçûna hilbijartinên Perlemana Kurdistanê û serkeftina wê piroseyê, Cîgirê Berdevkê Sikirtêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî Ferhan Heq duh peyama pîrozbahiyê ya Sikirtêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî gehand Herêma Kurdistanê û gelê wê. Cîgirê Berdevkê Sikirtêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî amaje jî da, "Piroseya hilbijartinan bi awayekî aram û hêmin bi rê ve çû."

Ferhan Heq herwesa got, "Sikirtêrê Giştî yê Neteweyên Yekgirtî piştewaniya hemî serkirdeyên siyasî û tex û çînên civakê ji bo berdeyam bûna li ser parastina rewşeke aram dike. Herwesa daxwazê ji aliyên siyasî jî dike ku her nakokiyê hilbijartinan bi rêya dezgehên qanûnî çare bikin û piroseya hilbijartinan temam bikin, ji bo pêkanîna hikûmeteke tevgir bi zûtîrîn dem."

Piroseya dengdana giştî ji bo hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê (Yekşem, 20.10.2024) bi rê ve çû. Du milyon û 686 hezar û 578 dengderan mafê dengdanê hebû, lê li dû amarên Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê, du milyon û 87 hezar û 972 kes tevî wê piroseyê bûn û rêjeya tevîbûnê 72% bû. Bilindtirîn rêjeya tevîbûnê jî li bazineya Dihokê hat tomakirin ku 78% bû, li Hewlêrê 74%, li Silêmaniyê 65% û li Helebceyê jî 69% bû.

Herêma Kurdistanê ji bo cara yekê tevî SIAL PARIS 2024ê dibe

Bi merema çêkirina peywendiyên rasterast bi kompaniyên weberhêner ên cihanî re û peyda kirina bazarî ji bo



berhemên xwemalî, şandeke Hikûmeta Herêma Kurdistanê tevî pêşangeheke mezin a warê pişesazî û berhemên xwerakî li bajarê Parîsê SIAL PARIS 2024ê dibe.

Şandeke Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo cara yekê tevî SIAL PARIS 2024ê dibe, ku pêşangeheke mezin a warê pişesaziya xwerak û berhemên xwarinê ye û li bajarê Parîsê bi rê ve diçe, herwesa zêdetir 17 hezar kompaniyên mezin ên warê pişesaziya xwerakî li ser astê 200 welatan tevî wê pêşangehê dibin.

Pêşangeha SIAL PARIS 2024ê li rojên 19 heta 23ê mehê bi rê ve diçe û Herêma Kurdistanê jî berhemên xwe yên çandinê yên xwemalî wekî petat, birinc, hingivîn, henar û doşava temateyan li nav wê pêşangehê berçav dike û bi vî rêyê bi sûka cihanê dide nasandin.

Malpera serekî ya SIAL PARIS 2024ê jî Herêma Kurdistanê li gel tevîbûyîyan û berhemên wan bi awayekî fermî tomar kirine, ji bo çêkirina peywendiyên rasterast bi wan kompaniyên weberhêner ên cihanî re ku daxwaz li ser berhemên Herêma Kurdistanê heyê.

Tevîbûna Hikûmeta Herêma Kurdistanê di SIAL PARIS 2024ê de derfeteke serekî ye ji bo çêkirina peywendiyên demdirêj bi weberhênerên navdewletî re û vekirina sûka nû ji bo berhemên Kurdî û nasandina Herêma Kurdistanê wekî çavkaniyê çandinê ya kalîf bilind.

Keskîn Bayindir: Divê tecrîd bê rakirin, pirsgrîka Kurd bi rêyên demokratîk bê çareserkirin

Hevserokê Giştî yê Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) saya berxwedana dayikan gihişt encamê. Em rojên zehmet dijîn lê



Keskîn Bayindir li navçeya Rezan a Amedê serdana endamên Meclîsa Dayikên Aştiyê kir.

Hevserokê Giştî yê Partiya Herêman Demokratîk (DBP) Keskîn Bayindir çû serdana endamên Meclîsa Dayikên Aştiyê ya li Rezan a Amedê. Berdevka Meclîsa Jinan a DBP'ê Bêrîvan Bahçecî, hevserokên DBP'a bajar û navçeya Rezanê, parlamentera Partiya Wekhevî û Demokrasiyê ya Gelan (DEM Partî) ya Wanê Gulderen Varli û endamên MYK'ê jî di serdanê de cih girtin. Dayikan, şande di derfê de pêşwazî kirin. Bayindir, ji ber êrişê li dijî dayikan a li Silopiyayê hêviya başî û silametiye kir.

Bayindir, di serfê de berxwedana dayikan a li Silopiyayê pîroz kir û wiha got: "Berxwedana we em serfiraz kirin. Em dizanin ku dayik ne tenê li Silopiyayê, ji Meclîsê heta girtîgehên li gelek cihan li ber xwe didin. Dayik pêşengtiya têkoşîna ji bo parçekirina vê pergale tê meşandin dikin. Dayik heta ku encamekî bi dest dixin jî dev ji berxwedana xwe bernadin. Grevên birçibûnê yên sala 2019'an jî bi

divê em hêvî û baweriya xwe zêdetir bikin. Ev 10 sal in vê dweletê politikayeke cuda daniye pêşiya xwe. Dixwazin têkoşîna kurdan vemirînin. Lê nekarî. Di serfê de dayik, jin û ciwan, gelê kurd seknekî dîrokî raber kir. Me bedelên giran da û berxwedaneke mezin raber kir. Vê serkeftinê û berxwedana mezin jî pêşiya me vekir. Divê em yekitî û rêxistiniya xwe mezintir bikin û ji bo destkeftiyên şênber ên hiqûqî û diplomatîk têkoşîne bêhtir mezin bikin. Em ê têkoşîna li Kurdistanê tu caran bi dawî nekin. Kurd tenê bi berxwedan û têkoşîne dikare bi ser keve."

Bayindir, bi domdarî gotinên Erdogan û Bahçelî bi bîr xist û ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk ketiye nava çiraveke mezin. Ji hêla aborî, leşkerî û diplomatîk ve ketiye nava çiravê. Têkoşîna gelê kurd mîna çirayekê li Rojhilata Navîn mezin dibe û her veketî ye. Têkoşîneke pir mezin a bînavber heyê. Gelê herfî birêxistinkirî yê Rojhilata Navîn gelê kurd e. Heke gotinên Bahçelî û Erdogan guherîbin, sedema xwe ev e. Em heta niha jî nikarin vî weke

pêvajoyeke çareseriyê yan jî aştiyê nabînin. Em jî dişopînin. Di axaftinên herduyan de jî ji bo çareseriyê aqilekî zelal tune ye. Herkes ji xwe re sînorekî diyar dike û li wir diaxive. Gelo daxwaza gelê kurd çi ye, dewlet dê li gorî van daxwazan xwe çawa biguherîne, mijara zimanê dayikê, pênasîya statûyê, rewşa li girtîgehên, tecrîda li ser Abdullah Ocalan û hwd. hêj didomin. Dema li Silopiyayê êrişî dayikên me dikirin jî li Enqereyê cuda diaxivîn. Heke derdê wan aştiyêke birûmet bûya dê êriş nekirina. Ev jî durûtiya wan nîşan dide."

Bayindir, anî ziman ku dewletê li her derê ji bo mitînga "Azadiyê" ya li Amedê qedexe anîbû û axaftina xwe wiha qedand: "Tevî hemû êrişan jî gelê kurd banga azadî û aştiyê kir. Israra ji bo wê mitîngê pir baş bû. Ev sekn pir girîng bû. Di 13'ê cotmehê de rêya çareseriyê hate nîşandan. Me du peyam dan. Rakirina tecrîdê û azadiya Abdullah Ocalan û çareseriya demokratîk a pirsgrîka kurd. Ev çareserî jî bi destûra bîngêhîn dibe. Em dibînin ku di nava dewletê de hinek tişt diguherin û em ê têkoşîna xwe mezintir bikin. Dewlet ji bo xwe li rêyê digere. Heta niha tu rêyên aştiyê, xwişk-biratiyê nîşan nedane. Tenê axaftine. Ev jî çareserî nîne. Divê em bi mezinkirina têkoşîne bersivê bidin. Têkoşîna gelê kurd ji bo hemû gelên bindest ên cihanê dibe moral. Heke ev têkoşîn were mezinkirin dê ji bo azadiyê firsendên mezin çêbibin. Çi dibe bila bibe dixwazin vî têkoşîne vemirînin. Dixwazin bi van axaftinan têkoşîna me bixin. Lê ew çi bikin jî dê têkoşîna me ya heq û hiqûqê bidome. Armanca me mezinkirina berxwedan û têkoşîne ye."

Piştê jî Dayikên Aştiyê axivîn, qala êrişê li Silopiyayê kirin û peyama "Ji bo aştiyê divê şer bi dawî bibe" dan.

Balyoza Amerîkayê pîrozbahiyê li xelkê Kurdistanê dike

Bi helkefta biserkeftina hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê, Balyoza Amerîkayê li



Îraqê pîrozbahiyê li xelkê Kurdistanê û partiyên siyasî dike. Balyoza Amerîkayê li Îraqê Alina Romanowski di beyannameyekê de, bi helkefta biserkeftina hilbijartinên gera şeşê ya Perlemana Kurdistanê, pîrozbahî li xelkê Kurdistanê û partiyên siyasî kir. Alina Romanowski herwesa got, "Karmendên Şandiya Wîlayetên Yekgirtî yên Amerîkayê li Îraqê çavdêriya dengdanê li binge-hên dengdanê li seranserî Herêma Kurdistanê kir." Balyoza Amerîkayê li Îraqê herwesa destxweşî jî li xelkê Herêma Kurdistanê kir, ji bo pabendbûna wan bi piroseya demokrasî.

Alina Romanowski amaje jî da ku, Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan amaje bi hebûna qebxwaziye li beranberî xwandina şuntiliyan di dema birêveçûna hilbijartinan de kir û got, "Em piştevaniya Komisyone dikin ku wê arêşeyê çare bike, berî hilbijartinên Perlemana Îraqê li sala 2025ê." Balyoza navbirî herwesa got, "Hikûmetê bê gîrobûn pêk bînin. Pêkanîna hikûmeta nû rêyê ji bo Hikûmeta Herêma Kurdistanê xweş dike ku, dezgehên xwe yên demokrasî bihêz bike, mafên mirovan pêş ve bibe, berdewamiyê bi pêşxistina aborî bide û xweragiriya Herêma Kurdistanê mukom bike."

Komîsyon: Rêjeya beşdarbûnê ji sedî 72 ye

Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê ragihand ku rêjeya beşdarbûnê ji sedî 72 ye. Dengdana hilbijartinên Parlamantoya Kurdistanê îro saet 07:00an dest pê kir saet 18:00an xelas bû.

Xelkê Herêma Kurdistanê çû ser sindoqan û dengê xwe da partî, lîste û nazmedên serbixwe.

Li 4 herêmên hilbijartinên mafê dengdanê



yê 3 milyon û 789 hezar kesan hebû.

Berdevkê Komîsyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartinan a Îraqê Eyser Yasîn îşev li ser hilbijartinên Parlamantoya Kurdistanê daxuyaniyek da çapemeniyê.

Li gorî amarên ku Eyser Yasîn dane, li gorî parêzgehên rêjeyên beşdarbûnê wiha ne:

Dihok: Ji sedî 78

Hewlêr: Ji sedî 74

Helebce: Ji sedî 69

Silêmanî: Ji sedî 65

Berpîrsê Desteya Hilbijartinan a Herêma Kurdistanê Neberd Umer jî da zanîn ku ji bilî çend pîrsgirêkên biçûk û teknîkî hilbijartin bê pîrsgirêk hatiye kirin.

Mesrûr Barzanî: Em naxwazin Herêma Kurdistanê tevî aloziyên Rojhilata Navîn bibe

Serokwezîr Mesrûr Barzanî di danûstandineke taybet de bi nûnerên tex û çînen parêzgeha Dihokê re bal kêşand ser çend pîrs û mijaran, nakokiyên li Rojhilata Navîn jî yek ji wan bû û di wê derbar de got: "Ew hemû hewlên xwe bidin da ku Herêma Kurdistanê têkelî van pîrsgirêkan nebe."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got: "Aloziyên li navçeyê rû didin, bêguman dê bandorê li hemû welatên herêmê bike. Lê bi me xweş bû û me kar kir ku Kurdistan têkelî van pîrsgirêkan nebe, Kurdistan nekeve şerê gelên din, ev şer ne şerê me ye."

Herwiha got: "Em dixwazin welatekî ne yê aram hebe û gelê me di nava aramiyê de bijî. Ji şer êdî bes e û em hemû ji şer westiyane û em naxwazin tevî vî şerî bibin."

Serokwezîr Mesrûr Barzanî got, wan hemû hewlên xwe dane ji bo ku ji welatên cîran û derdora Herêma Kurdistanê re bibêjin ku Herêma Kurdistanê ne metirsî ye li ser berjew-



endiyan ti welatekî û got: "Ji bo aştî, aramî û ewlekariya li vî navçeyê zêdetir bibe, em amade ne her tiştî bikin. Em naxwazin bikevin nava vî şerî û tevî vî şerî jî nabin."

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê bal kişande ser wê yekê ku peywendiyên Herêma Kurdistanê li gel

welatên bihêz û welatên biyanî di asteke gelek baş de ne, peywendiyên Herêma Kurdistanê ligel welatên derve di astekê de ye ku gelek welat ji herêmekê zêdetir hesabê Kurdistanê dikin. Gelek caran serederî bi Herêma Kurdistanê re wek welatekî serbixwe tê kirin.

Amerîka: Divê hikûmeteke ku xelkê temsîl dike bê derengî were avakirin



Wezaretê Karên Derve ya Amerîkayê diyar kir ku hilbijartinên Parlamantoya Kurdistanê bi awayekî dadmend û bi rêkûpêk hatin lidarxistin.

Wezaretê Karên Derve ya Amerîkayê bangî aliyên siyasî jî kir ku ji bo pêkanîna hikûmeteke ku nûneriya dengê xelkê bike dest bi danûstandinan bikin.

Cîgirê Berdevkê Wezaretê Karên Derve ya Amerîkayê Vedant Patel li ser hilbijartinên Parlamantoya Kurdistanê pîrsên Berpîrsê Ofîsa Rûdawê ya Washingtonê Diyar Kurde bersivandin.

"Em aliyên siyasî teşwîq dikin bêyî dereng bimînin hikûmetê ava bikin"

Vedant Patell li ser hilbijartinên Herêma Kurdistanê wiha got:

"Em di wê baweriyê de ne ku di nav rêberên Kurd ên Herêma Kurdistanê Îraqê de xalên zêde hene ku wan dike yek ne ku wan parçe dike.

Di berjewendiya xelkê de ye ku bi pêş ve biçin û ji bo avakirina hikûmeteke bilez dem derbas nekin.

Bihêle ez çend tiştan ji we re bibêjim, pêşxistina nixê demokrasî jî bo hikûmeta Amerîkî pêşkerî ye û hebendiyên bihêz dike.

Me dît ku gelek kes beşdarî hilbijartinan bûne, pêvajoya hilbijartinê bê pîrsgirêk û rûdanên mezin hat lidarxistin.

Haya me ji hin raportan heye ku li hin navendên dengdanê hin pîrsgirêkên teknîkî çêbûne lê di dawiyê de û bi giştî li gorî me dengdan hat kirin.

Em aliyên siyasî teşwîq dikin bêyî dereng bimînin bi rêya diyalogê berdewam ji bo pêkanîna hikûmeteke aram ku nûneriya gel dike.

Ez niha nikarim pêşbîniyên taybet bikim lê em ji serkirdayetiya Kurdistanê dixwazin ku rêyekê ji bo derbaskirina nakokiyên xwe û avakirina hikûmetê bibînin."

Li heyva derbasbûyî de 27 çalakvanên siyasî û medeniyên Kurd hatine binçavkirin

Li heyva Rezberê de zêdetir ji 27 çalakvanên siyasî û medeniyên Kurd ji aliyê rêjîma Îranê ve hatine binçavkirin û bi gelemper 23 sal û yek heyv girtîgeh, salek girtîgeha ragirtî û 70 derbên qamçiyên bi ser wan de hatiye sepandin. Pêka amarên ku Encumena girtiyên siyasî yên Kurdistanê Îranê "Xwragirî" yê belav kiriye, li heyva Rezberê de zêdeyî ji 27 çalakvanên siyasî û medeniyên Kurd li bajarên Cuda yên Rojhilatê Kurdistanê de ji aliyê dezgehên ewlehî û serkutker ên rêjîma Îranê ve bi tohmên wek "çalakiya medenî, dijayetî digel rêjîmê, hevkarî digel hizbên Kurd ên opozîsiyona rêjîma Îranê" hatine girtin û bo girtîgehên îtilaata rêjîmê hatine veguhastin.

Pêka vê raporê, hejmarek ji wan girtiyan piştî lêpîrsînan, bi danîna barimteyên giran hatine azadkirin û hejmarek jî hêj li odeyên jêpîrsînan de ne û qedera wan nexuya ye.

Pêka vê amarê, 16 çalakvanên siyasî û medeniyên Kurd ku pêştir ji aliyê rêjîmê ve hatibûne binçavkirin, li vî heyvê de siyazyên wek bidarvekirin, girtîgeh û sizaya nexdî bi ser wan de hatiye sepandin. Bi gelem-



per rêjîma Îranê 23 sal û yek heyv girtîgeh, salek girtîgeha ragirtî û 70 derbên qamçiyên bi ser wan 27 çalakvanên siyasî û medeniyên Kurdistanê de sepandiye. Liheyva Rezberê de "Hemîd Husênîjad" ê xelkê Çaldîranê, bi tohmata endametî li Hizbek a dijî rêjîma Îranê ji aliyê dadgeha înqilab a rêjîmê ve sîza-ya bidarvekirinê bi ser de hate sepandin.

Binpêkirina mafê mirov li Rojhilatê Kurdistanê, ji aliyê rêjîma Îranê ve berdewam e û ew rewş roj bi roj tundir û zêdetir dibe.

Bahçelî, Ocalan vexwend Parlamentoyê: Erdogan çî got?

Recep Tayyîp Erdogan li ser gotinên Bahçelî yê derbarê Ocalan got, "Divê pencereya derfeta dîrokî ya



ku ji aliyê Tifaqa Cumhur ve hatiye vekirin, nebe qurbaniya hesabên şexsî." Serokê MHPyê Devlet Bahçelî got ku bila Ocalan were li parlamentoya Tirkîyeyê di komcivîna DEM Partiyê de biaxive.

Serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan piştgirî da van gotinên Bahçelî û got, "Divê pencereya derfeta dîrokî ya ku ji aliyê Tifaqa Cumhur ve hatiye vekirin, nebe qurbaniya hesabên şexsî."

Recep Tayyîp Erdogan wiha axivî: "Alozî û siyaseta kolanan ne tenê bi kesên ku serî li vê yekê didin, dê bi mîlet û hemû welat bide windakirin.

Mafê tu kesî nîne ku barê welatê me hîn girantir bike. Ev gel ti carî kesên ku bikeve hesabên şexsî efû nake.

Girîng e desthilat û muxalefet, em hemû pîm nedin şerê kelekvanan. Helbet tiştê ku em rast nabînin emê rexne bikin.

Em ê bersivê bidin êrîşên li dijî partî û hikûmeta xwe lê dema ku van bikin, em dê hevsiyê biparêzin û aramiya xwe biparêzin.

Em teqez li hemberî neheqiyê bêdeng namînin. Em ji kesên ku pirsgrêka wan bi sirûda me ya netewî re heye û demokrasiya me xera dikin re nabêjin 'ser seran'. Em hêvî dikin ku her kes zanibe ku di paşeroja Tirkîyeyê de cihê terorê nîne.

Divê pencereya derfeta dîrokî ya ku ji aliyê Tifaqa Cumhur ve hatiye vekirin, nebe qurbaniya hesabên şexsî. Em dixwazin bi hev re Tirkîyeyê bê teror ava bikin."

Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan (YNK) ji encama hilbijartinê raziye

Polîtburoya Yekîtiya Niştîmanî Kurdistan (YNK) ragihand ku hilbijartinê di 20ê Cotmehê de çêbû ya Parlementoya Kurdis-



tanê, bi serkeftin derbas bûye û fikra wan bi vî rengiye. Civîna polîtburoya YNK di bin serpereştîya serokê wê Bafil Talabanî de hat kirin.

Polîtburoya YNKê, civîna xwe li baregeha xwe ya nûh kir û li ser hilbijartinên 4 parêzgehên Kurdistanê encaman rave kirin. Buro ya YNKê daxuyanî da û ji ber hilbijartinê xelkê Kurdistanê û hilbijêrên xwe pîroz kir. YNK ragihand ku sozên di hilbijartinê de daye, ji bo bi bicîhanîna wan sozan, xwe amade dike û got:

"Ji niha û pê de, divê em xwe ji bo hilbijartinên Iraqê amade bikin û divê YNK sekeftinê xwe yê li Kerkûkê û Herêma Kurdistanê bêhtir pêş bixe."

YNK, di hilbijartinên 20ê Cotmeha 2024an de di parlamentoya Kyurdistanê de 24 kursî bidest xistibû û bûbû partiya duyem ya Kurdistanê.

Ezîzê Zîyo Bedîrxan - Xelatgirê ordena "Yekîtiya Welat"!



Assambleya Gelên Qazaxistanê, Serokê "Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê - "Barbang"ê, karsaz, karmendê civakê Ezîzê Zîyo Bedîrxan bi ordena "EL BIRLIGI" - (Yekîtiya Welat) bi biryarnameya û ji destê Serokomariyê Komara Qazaxistanê Qassym-Jomart Tokayêv hat xelatkirin.

Ordena "El Birliji" - xelata dewletê ya Komara Qazaxistanê, di sala 2023 de hate damezrandin. Ew kes layiqî Xelata "El Birliji"ê dibin, ku ji bo xebateke berhemdar bi navê



Di 23ê Cotmeha 2024an de li bajarê Astanayê bi boneya Cejna Komara Qazaxistanê çalakiyêke bi heybet hat lidarxistin. Merasimek hate lidarxistin û tê de endam û hemfikirên Meclîsa Gelên Qazaxistanê wê rojê bi xelatên taybet hatin xelatkirin, ku di bihêzkirina serweriya Komara Qazaxistanê, lihevhatina giştî û yekîtiya netewî de, pêşxistina diyaloga navçandî û welatparêziya Qazaxistanê da keda wan heye.

Bi taybetî, endamê rêvebirîya



Amerîka, Brîtanya, Almanya û Fransa daxwaza rawestandina Şerê Xezeyê dikin

Serokê Amerîkayê û serokên Fransa, Brîtanya û Almanyayê tekeziyê li ser "pêwîstiya" bidawîanîna Şerê Xezeyê dikin.

Serokê Amerîkayê Joe Biden, Serokê Fransayê Emmanuel Macron, Serokwezîrê Brîtanyayê Keir Starmer û Serokwezîrê Almanyayê Olaf Scholz li Berlîna Almanyayê civiyan û daxuyaniyêke hevpar da.

Serkirdyên Amerîka, Fransa, Brîtanya û Almanyayê di daxuyaniya hevpar de ragihand ku ew li ser "pêwîstiya bilez a bi vegehandina dîlan a li malbatên wan, bidawîanîna Şerê Xezeyê û misogerkirina alîkariya mirovî bigihêje sivîlan" hemfikir in.

Her çar serkirde li Berlînê civiyan û wan got:

"Me bûyerên li Rojhilata Navîn, bi taybetî encamên kuştina Yehya Sinwarê berpîrsê êrişê terorîstî ya 7ê Çiriya Pêşînê bû, gotûbêj kirin."

Biden, Macron, Scholz û Starmer diyar kir ku ew di civînê de li ser şerê li Libnanê jî axivîne û "Em êrişê Îranê ya li dijî Îsraîlê şermezar dikin."

Şerê Xezeyê

Çekdarên Hamasê 7ê Çiriya Pêşîn a 2023yan ji Xezeyê der-



basî nava Îsraîlê bûn û êrişî 21 navendên sivîlan ên Îsraîlê kir.

Piştî êrişê Hamasê Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu peyamek belav kir û wiha got:

"Welatîyên Îsraîlê, em di şer de ne. Hamasê êrişî Îsraîlê û Îsraîliyan kir."

Li gorî gotina berpîrsên Îsraîlê, ji ber êrişê Hamasê hezar û 139 kes hatin kuştin û 200 hezar kes jî koçber bûn. Her wiha 250 kes jî hatin dîlgirtin. Heta niha 117 dîlên Îsraîlê hatine rizgarkirin û 72 kes jî mirine.

Heman rojê Îsraîlê dest bi bombebarankirina Xezeyê kir û

13ê heman mehê jî dest bi operasyonêke bejayî kir.

Li gorî Wezareta Tenduristiyê ya Xezeyê, heta niha 41 hezar û 870 kes di şerê Xezeyê de hatine kuştin û 97 hezar û 166 kes jî birîndar bûne û herî kêm 2 milyon kes jî koçber bûne.

Berpîrsên Îsraîlê eşkere dikin ku heta niha wan zêdetir ji sedî 60ê çekdarên Hamasê kuştine.

Beriya bi demêkê Hikûmeta Xezeyê amarên dawî yê şer bi Rûdawê re parve kirin.

Li gorî hikûmeta Xezeyê, bajar ji sedî 86 wêran bûye û 41 hezar û 870 kes mirine 10 hezar kes jî winda ne.

xurtkirina yekîtiya neteweyî û dabînkirina hevgerîna civakî.

Kurdên Qazaxistanê bi dilgermî pîrozbahiyê li Ezîzê Zîyo Bedîrxan dike ku bi ordena "El Birliji" hatiye xelatkirin û jê re saxlemî, bextewarî zêdetir di çalakiyên wî de ji bo pêşkeftin û bextewariya gel û welat dixwaze.

Bo vê xelata Komarê ya here bilind, jê ra serfiraziyê û serkeftinê dixwezînin. Em hêvîdar in, ku em bi serokatîya Ezîzê Zîyo Bedîrxan, bi awayekî serketî berdewam bikin.

DEM Parti, Öcalan'ın tahliyesi için kanun teklifi vermiş... Teklif Adalet Komisyonunda

MHP Genel Başkanı Devlet Bahçeli, yararlanmasının önü de ardına kadar açılınsın" ifadesini kullandı.



toplantısında Abdullah Öcalan'a çağrıda bulundu, DEM parti harekete geçti. DEM Parti'nin 30 Eylül'de Öcalan'ın koşullu salıverme hakkından yararlanabilmesi için TBMM'ye kanun verdiği ortaya çıktı.

TBMM'nin yeni yasama yılının açılışında MHP Genel Başkanı Devlet Bahçeli, DEM Parti Eş Genel Başkanları ile tokalaştı. Bahçeli, 15 Ekim'deki parti grup toplantısında yaptığı konuşmada ise İmralı Cezaevi'nde bulunan Abdullah Öcalan'a seslenerek, "Terörün bittiğini, örgütünün tasfiye edileceğini tek tarafı ilan etsin" çağrısında bulundu. Bahçeli'nin bu çıkışları sonrası "yeni çözüm süreci mi başlıyor" sorusunu akıllara getirirken MHP'nin son grup toplantısında Bahçeli, "Terörist başının tecridi kaldırılırsa gelsin TBMM'de DEM Parti grubunda konuşsun, terörün tamamen bittiğini, örgütün lağvedildiğini haykırınsın. Bu dirayet ve kararlılığı gösterirse, 'Umut Hakkı'nın kullanımıyla ilgili yasal düzenlemenin yapılması ve bundan

Bahçeli'nin bu çıkışını tepkiler gelmeye devam ederken, DEM Parti Grup Başkanvekili Erzurum Milletvekili Meral Daniş Beştas'ın 30 Eylül'de "Ağırlaştırılmış müebbet hapis cezasının infazında 25. yılda koşullu salıverilme şartlarının değerlendirilmesi için bazı kanunlarda değişiklik yapılması" hakkında kanun teklifi yeniden gündeme geldi. Beştas'ın teklif Adalet Komisyonu'nun gündeminde bekliyor.

Teklifte yer alan maddeler "Türkiye'de idam cezası 2004 yılında kaldırılmış, yerine ağırlaştırılmış müebbet hapis cezası getirilmiştir. Türk Ceza Kanunu'nun geçici 2. maddesi, idam cezası olan terör suçlularının koşullu salıverilme hakkından mahrum kalmasını öngörmüştür. Ağırlaştırılmış müebbet hapis cezası, infaz koşulları açısından oldukça serttir ve hükümlüler yalnızca tek kişilik hücrelerde tutulmaktadır.

